

# Xizmeta taybet bo kesê taze hatî

29 ê Desembera 2015

## Bi xêr bên bo Ontariyo

Bi xêr bên bo Ontariyo, Ev parêzgehe ciyawaztirîn parêzgeha Kanada yê ye, ku nîv ji koçberên Kanadayê xwe da cî kirîye.

Gelek koçber bi sedema hebûna derfetên şolê Ontariyo bo jîyanê dibjêrin. Xelk mezintirîn sermayeya me ne û em ji hêz û şarezayîya ku gel xwe ji ev parêzgehê re anîne, pêşwazî dikin. Beşdarbûna we di cûdahîya çandî ya Ontariyo jîyana me ya civakî û abûrî nûjîn dike û dibe sedema afirandin, nûnanîn û girêdana parêzgeha me ji torên gerdonî re.

Ev belge ya agahîyan gelek bername û xizmetên Wezareta Hewwelatî, Koçberî û Bazirganîya Derwe pênase dike daku bi alîkarîya wan bikarin di parêzgeha me da rûnên û jîyana xwe ya nû di nav da destpê bikin Ministry of Citizenship, Immigration and International Trade to help you get settled and begin your new life in our province.

## Bernameya Rûniştandina Kesê Nûhatî û Xizmeta Rûniştina Dûbareya Koçberan

Bernameya Rûniştandina Ontariyo Taybet bo Kesê Nûhatî hinek xizmetan bo rûniştandin, pênasekirina gel şeweya jîyanê di Ontariyo û damezirandina pêwendiyên civakî pêşkêş dike. Xizmetên rûniştandinê bi zimanên cûda tene pêşkêş kirin daku hûn bikarin agahîyan, emrazan, jêderan û piştgirîya civakî ya pêwîst bo tevî hevbûna serkevtî mifa werbigirin. Pêwîste hûn bizanin ku ev xizmetên rûniştandinê di gelek civakên Ontariyo da û bi belaşî pêşkêş dibe.

Xizmetên rûniştandinê ji babetên jêr pêk tê:

- Alîkarî dan ji were bo bidestana xizmetên dewletî û civakî yê pêwîst
- Bersivdana pirsên we liser civaka nû
- Alîkarî dan ji were bo peyda kirina cîyekê bo jîyanê
- Alîkarî dan ji were bo pirkirina fomran
- Alîkarî dan ji were bo peyda kirina şolê yan berdewam kirina perwerdehîyê
- Peydakirina dibistan yan baxçeyê zarrokan
- Bidestana xizmetên dermanî
- Alîkarîdan ji were bo peydakirina kûrsên perwerdehîya zimanê Inglîzî/Fransî
- Alîkarî dan ji were bo çareser kirina kêşeyên taybet bi dema derbasîyê û rûniştinê
- Wergêrra belgeyan yan pêşkêş kirina xizmetên wergêrra hevdem

Pê serdana <http://settlement.org> dikarin agahîyên bêtir liser xizmetên rûniştandinê, bidest bixin.

Di Bernameya Rûniştandina Taybet bo kesê nûhatî, alîkarî yê pisporî ji penaberên vergerandî bo parêzgehê, pêkhatî ji penaberên meşmûlî alîkarîyê şexsî û dewletî, bi rêya torên rêkxerên pêşkêşkerên xizmetên rûniştinê dubare di şeş civaka Ontarîyo da hatîye pêşnêrîn kirin: Toronto û Herema Toronto ya Mezin, Ottawa, Hamilton, Windsor, Kîçener û London.

Ev Rêxistinane dikarin di babetên çêkirin û cîbecî kirina bernamêyên şexsî bo dabîn kirina pêwîstîyan û gehîştina ji armancên jîyana nû ya we di Ontarîyo alîkarîyay we bike. Ev dikarin di babeta gehîştina we ji xizmetên dî wekî avahî, şol û saxlemîya derûnî û herwisa bernamryên bi armanc taybet bi zarrokan, jîyan û nûciwanan dabîn bikin. Bo peydakirina rêxistinên Bernameya Alîkarîya gehandina Rûniştandina Dubare (RAP), kerema xwe biçîne [http://www.citizenship.gov.on.ca/english/newcomers/refugee\\_services.shtm](http://www.citizenship.gov.on.ca/english/newcomers/refugee_services.shtm)

## **Perwerdehiya Zimanê Ne Yekîne Taybet bo Mezinsalan**

Kanada yê du ziman hene: Inglîsî û Fransî. Pêwîste ku şarezayîyên taybet bo damezirandina pêwendîya gel zimanê civakê û zimanê herêma şolê bidest bînin.

Hûn dikarin bi belaş di kursên destpêkî, navendî û pêşketî yê Inglîzî û Fransî wekî Zimanê Duyem (ESL/FSL) beşdar bin. Ev bernamêyên giştî bo axavtin, guhdan, xwandin û nivîsînê ne. Bo amade bûna tîketina bazara şolê di Ontarîyo da dikarin di kûrsê perwerdehiya şarezayîya zimanî da beşdar bin. destpêkê şarezayîyên zimanî yê we yê heye di navenda heremî ya Xizmeta Hevdegiya Lêkolîn û Jêdera Zimanî (CLARS) tê lêkolîn kirin daku zalal be ku çî kurs bo dabîn kirina pêdiviyên we kêrahitî ne.

Pê serdana <http://www.Ontarioimmigration.ca/en/learn/index.htm> dikarin agahiyên bêtir liser fêrbûna ziman û navendên CLARS, bidest bînin. û bo lêkolîn kirina ziman li bendê bimînin.

## **Bernameyên Perwerdehiya Navendî**

Bernameyên Perwerdehiya Navendî ji kesê xwediyê perwerdehiya navnetewî alîkarî dike bilez bikeve nava bazara şola Ontarîyo yê. Di ev bernamê şarezayî û hêjayîyên we ligor pîvanên xwedîkarê Ontarîyo yê tene lêkolîn kirin û perwerdehiyên pêwîst bo xebata di cîyê şola Kanada yê da pêşkêş dibe.

Perwerdehiya Navendî komek cûrbicûr ji perwerdan û xizmetên siparişî wekî perwerdehiyên zanistî û pîşeyî wekî kursa amadeyîya beşdarbûna di taqîya bidestana izinê, şarezayîyên şûna şolê, rahênkerî, tecrûbeya cîyê şolê û tora çêkirina pîşeyî, pêşkêş dike.

Bi serdana [http://www.Ontarioimmigration.ca/en/working/OI\\_BRIDGE.html](http://www.Ontarioimmigration.ca/en/working/OI_BRIDGE.html) dikarin agahiyên bêtir liser bernamêya perwerdehiya navendî bidest bînin.

## **Tecrûbeya Gerdonî ya Ontariyo**

Tecrûbeya Gerdonî ya Ontariyo (GEO) ji koçberan re alîkarî dike belegeyên perwerdehiyên bîyanî yê xwe binirxînin û izina şolê di Ontariyo da bo xebata di pişeyên zagonî yê ne bijîşkî û xebatên pişeyî bidest bînin.

Ev navenda giştî dikare di babetên jêr ji were agahîyan û danenasîn nameyê pêşkêş bike:

- bidestanîna izinê bo pişeyên zagonî yê ne bijîşkî û xebatên şarezayî
- Nirxandina belgeya berwerdehiyê
- Bernameyên şolê û perwerdehiyê taybet bo zarrokan bo bidest anîna izina xebatê di babetê pêwendîdar da.
- navendên xebatên pisporî yê pêwendîdar Tor, Navendê hîn kirina şolê û navendê rahênankerîyê pisporî

Bi serdana <http://www.Ontariyoimmigration.ca/en/geo/index.htm> dikarin agahîyên bêtir liser Tecrûbeya Gerdonî ya Ontariyo navendî bidest bînin.

Wizareta daxlemî û parastina demdirêj, xizmetên wisa bi rêya Navneda Berdestbûna HelathForce di Ontariyo da ji pisporên bijîşkî yê xwedîyê bawernameyên navnetewî pêşkêş dike. Pê serdana navnîşana jêr dikarin agahîyên bêtir bidest bînin

[http://www.healthforceontario.ca/en/M4/Internationally\\_Educated\\_Health\\_Professionals/Licensing](http://www.healthforceontario.ca/en/M4/Internationally_Educated_Health_Professionals/Licensing)

## **Xizmetên Wergêrra Hevdem**

Xizmetên Wergêrra Hevdem ji qorbanîyên şideta malbatî yan şideta cinsî ku tûşî kêşeya zimanin, alîkarî dike ku alîkarîyên giştî wekî xizmetên civakî, dermanî û mafî werbigire.

Eger hûn qorbanîyê şideta malbatî yan şideta cinsî ne, dikarin di asta Ontariyo bi belaşî ev xizmeta 24 demjimêrî bikar bînin.

Bi serdana <http://www.citizenship.gov.on.ca/english/grantsandfunding/language.shtml> dikarin agahîyên bêtir liser Xizmeta Wergêrra Hevdemî bidest bînin.